

# ÇEND TÊBÎNÎ DI DERBARÊ PIRSÊN R'ASTNIVÎSÎN Û R'ASTAXAVTINÊ DA

**Ezîz ê Cewo**

**Di k'urdî da zayenda r'êzimanî ya navdêran û zêder hene, lê ...**

Her zimanek qanûnên xwe yê hindur'în hene, û anegorî wan qanûnan jî t'evaya sazîya zimên, wek sîstêmekê, ava dibe. Anegorî wan qanûnan awaz, p'eyv, p'eyverêz û hevok tên hevûnandin, û axavtin pêk tê...

Ji bo ku ew qanûnan bên naskirin, têgihîştin û bi zanistî bên tomarkirin, sedsal bihurîne... Û, dema nivîs p'eyda bûne, hinek kesên xwendî r'aman û zanînen pêwîst hewl dane wan qanûnên hindur'în ên zimên tê bigihîjin, derxin zanebûnê û bi sîstemî t'omar bikin, ji bo ku mirov bikaribin bi zimanê xwe bê şaşî û kêmasî biaxivin û binivîsin. Û di encamê da r'êziman p'eyda bûye, wek t'omarîya qanûn û r'êzikên zimanê konkrêt. Hema ev jî bûye bingeh û hêman, ku mirov bikaribe hem r'ast biaxive û binivîse, hem jî r'esenî, paqijî û ahengîya hindur'în a zimanê xwe dip'arêze. Di nava wan qanûnan da, ji bo encama dawîyê ya pêkanîna axavtina zarkî an nivîskî ya r'ast û durust, qanûna *r'astnivîsîn* û *r'astaxavtinê* (*orthography & orthoepy*) cîyê xwe yê t'aybet heye. Ango, ew, k'a mirov p'eyvan çawa dinivîsin, çawa bi wana hevokan dihûnin û paşê jî çawa dixwînin, p'ir' girîng e...

Û ev girîngî ne tiştekî şewazî-formal e, ev pêdivîyeke xwezayî û mercê hebûna zimên bi xwe ye, lewra ku ziman qaliv û t'eşedarê r'amana mirov e. Mirov bi r'êya zimên r'aman û mitaleyên xwe digihîne, tine ser hev, hev dihûne, wat'edar dike û bi zimên jî wan r'amanan p'arvedike an r'adigihîne – bi zarkî an bi nivîskî. An jî, eger mirov bi awayekî dinê bibêje, ziman hêmana mitalekirinê ye, mirov bi zimên r'aman dike. Û, eger, em bibêjin, heya kesek p'eyv û têngî û hevokan ne anegorî qanûnên xwezaya hindur'în a zimanê xwe bi k'ar bîne jî, yek e, ji ber ku ziman bi xwe, bi t'evahîya sazîya xwe va, sîstêmek e, û bi sîstemî jî cîhana mirov a r'amanî û r'ewanî ya hindur'în dip'arêze, lewra jî ew şaşî, yê ku ji hêla kesê konkrêt va di axavtin an nivîsînê da pêk tine, bi neyînî bandura xwe li ser r'aman û r'ewana wî dihêlin û wê cîhana wî ya hindur'în, a ku bi xwezayî pêk hatye, serûbinî hev dikin û hevahengîya wê sîstemê dikin xeterê... Û di encama vê da dertê, ku ew cîhana, mîna xweyê xwe, êdî nikare t'endurust e ...Ev jî ji hêla xwe va bandora xwe ya neyînî li ser r'eng û t'eşe û demê net'ewî dihêlê ...

Û, dema kesekî sade yê r'êzê wan şaşîyan pêk tîne, eger r'êzimanêke r'êk û pêk û durust hebe, ew şaşî dê ji bo wî zimanî zêde pirsgirêkek nînbîn, lê, eger ew şaşîyana di r'êzimanê da cî digirin, an kesên ku bi p'erwerdeya zimên va mijûl in, wan şaşîyan wek “*r'astî*” li şagirt û xwendevanan ferz dikin, ev êdî xeterêyeke mezin e ji bo zimên û ramana mirov, ev malwêranî ye! ...

Ji bo ku ev r'ewş baş bê têgihîştin, ezê li vira her tenê çend mînakên bînin, ên ku di dema xwe da an min jî axavtina zêndî ya r'ojane, ji çapemenîyê û medya civakî hildane, an jî xwendevanan ew ji min r'a şandine:

“*Ez gul im, gulekî sipî me...*” – Li vira ew kes, ên ku sîstema hindur'în a zimanî-r'amanî di wan da li ser xwezaya zimanê k'urdî ya r'esen pêk hatye, dê destxweda bibêjin: “Eger p'eyva ‘gul’ navdêreke zayenda mêza ye (û ew wisa jî heye!), wê demê divê ev hevoka anegorî qanûnên hindur'în ên zimanê k'urdî (ango, anegorî r'êzimana k'urdî) weha bihata nivîsîn: “*Ez gul im, guleke sipî me!*”...”

“*Evina herî piroz axa mêrove ... dayika me yî K'urdistan...*” – Ev hevoka jî, ya ku ji hêla hestên net'ewî va p'ir' wat'edar e, lê şewazê wê yê bi r'êzimanî çewt hem wan hestan, hem jî ahengîya hindur'în a zimên û r'amanê serobinî hev dike. Gelo ev gotinên

hêja dê çiqasî wat'edar bûna û nêzikî r'uh û r'ewanê k'urdî bûna, eger ew li ser bingeha k'urdîyeke r'esen a bi r'êzimanî r'ast û durust hatibûna avakirin? Bala xwe bidinê: **“Evîna here pîroz axa mirov e – dayika me ya(ye) K’urdistan!...”** – Çima? – Lewra ku li vira pêşdaçeka ‘her’ di hevokê da bi r’engdêra çawanî r’a hatye bik’aranîn û asta çawanîya wê ya ji hemûyan bilindtir dide zanîn. Di vê mînaka me da **evîna ji hemûyan (her tiştî) pîroztir** dide zanîn, û di hevokê da, dema bi navdêrê r’a tê bik’aranîn, bi xwezayî di navbera wê û navdêra konkrêt da, anegorî zayenda wê, zêdera makdêrî ya konkrêt tê danîn (ya/a, yê/ê an yên/ên): **‘evîna here (her a) pîroz’, ‘p’êxemberê herî (her ê) pîroz’** û **‘nîrxên here (her ên) pîroz’**. Ji bilî vê, ji ber ku di dema xwe da, dema di k’urdîya kevnar da wisa jî zayenda navdêran a navîn (neutre) hebûye, anegorî wê jî di k’urdî da zêdera zayenda navîn a **‘yî/î’** hebûye. Û dema ku di pêvejoya dîrokî da cudakirina navdêrên zayenda navîn di k’urdî da r’awestyaye pêkan be (ji ber ku navdêrên wê zayendê derbazî nava r’êzên navdêrên nêrza bûne, (Di vê derbarê da bi hûrbînî di p’irtûka A. Mamoyan a “T’aybetmendîyên r’êzimanî yên navdêr û bingehên destpêkî yên mak-zimanê hindewropî di k’urdî da”, rûpel: 169 – 174. – [https://www.academia.edu/38273718/ГРАММАТИЧЕСКИЕ\\_КАТЕГОРИИ\\_СУЩЕСТВИТЕЛЬНОГО\\_И\\_ОСНОВЫ\\_ИНД\\_ОЕВРОПЕЙСКОГО\\_ПРАЯЗЫКА\\_В\\_КУРДСКУОМ\\_pdf](https://www.academia.edu/38273718/GRAMMATICHESKIE_KATEGORII_SUЩЕСТВИТЕЛЬНОГО_И_ОСНОВЫ_ИНД_ОЕВРОПЕЙСКОГО_ПРАЯЗЫКА_В_КУРДСКУОМ_pdf)), zêdera wan wek arxaîzm di k’urdî da hatye p’arastin, û, ji ber ku zêdera zayenda navîn bûye, ew t’enê bi p’eyvên ne navdêr r’a hatye bik’aranîn, ên ku ji hêla zayendê va bêt’eref bûne. Mînak: **‘herî kêna’, ‘herî zêde’, ‘herî dereng’, ‘herî zû’...** Û di pêvejoya pêşvaçûnên zimên da şêwazê **‘herî’** êdî bûye p’eyveke serbixwe (lexicalization), a ku bi wî şêwazê xwe va t’enê bi peyvên ne navdêr ra tê bikaranîn: di mînakên me yên li jorê da – bi r’engdêran (**‘kêna’** û **‘zêde’**) û hokeran (**‘dereng’** û **‘zû’**) r’a.

Mirov dikare heman tiştî ji bo vê hevokê jî bibêje:

**“Ev tê wî wateyî Perestgeha herî kevnar a cîhanê”**. – Şêwazê wê yê r’ast jî divê weha be: **“Ev tê wê wat’eyê, ku ew p’erestgeha here (her a) kevnar a cîhanê ye”**. – Çima? – Ji ber ku p’eyvên **‘wat’e’** û **‘p’erestgeh’** navdêrên zayenda mêza ne...

Wekî dinê xwendevan bi xwe jî dikarin hevokên weha yên bi r’êzimanî çewt bibînin, analîz bikin û dîtî û nêr’înên xwe di wê derbarê da bi me r’a p’arve bikin.

Û dema iro hinek kes şêwazê **‘herî’** di nava axavtina xwe ya zarkî û nivîskî da ne di cîyê wê da bi k’ar tînin, li bal wan kesan, ên ku di nava wan da sazîya zimnê k’urdî bi xwezayî hatye p’arastin, dixwazin bikin qêrîn, hewar û hêwarzeyekê derbixin,, Bi wî awayî, sazîya zimên, a ku di nava mirov da bi xwezayî ava bûye, ji bo zimên bûye sîstêma xweewlehîyê, û her carê, dema ew xeterîyê li hember r’esenîya xwezaya zimên hîs dike, hişyarîyê dide...

Û lewra jî gelek xwendevanên me dipirsin: **“Ew mirov, ên ku vê t’evlihevîyê di zimên da pêk tînin, bi zanebûnê dikin, an, ji ber ku wisa jî bo wan hêsantir e?”** – Helbet min di p’eyamên xwe da bersîvên pîrsên wan dane, lê li vira ji bo xwendevanên hêja dubare bibêjim, ku bi vî şêwazî hêsantir e, ji ber ku K’urdistan mêtîngeheke nvnêwî ye, li hember k’urdan vekirî siyaseta bişavtinê tê meşandin, zimanê k’urdî jî ji hêla sîstêma mêtînger va di bin qedexê û înk’arê da ye, ew bi t’unekirinê r’a r’ûberû maye, lewra jî gelek k’urd, wek kes, li ser bingeha wê dewlemendîya r’êzimanî ya p’ir’şêwazê pêk nehatine, ew di nava derdorên bîyanî da mezin bûne û her paşê k’urdî hîn bûne, ewana evê cudahîyê hîs nakin û tê jî nagihîjin, lewra jî, bêyî r’ayê xwe, bêyî ku ewê tê bigihîjin, berê xwe didin r’êya here sade û prîmîtv. Ji ber ku ev r’êyeke here hêsan e! Û dibe ku ewana bi xwe jî hîs nakin, ku bi wî awahî ahengîya xwezayî ya zimanê k’urdî serobînî hev dikin...

Û dîsa çend mînakên nehev dengîya zayendî di navbera endamên hevokê da:

**“Slehettîn Demîrtaş Mehmedê zirav ê vî axî ye!”** – Şêwazê wê hevokê yê r’ast jî divê weha be: **“Saleheddîn Demîrt’aş Mehmedê zirav ê vê axê ye!”** – Çima? – Li ber çavan e, ku p’eyva **‘ax’** navdêra zayenda mêza ye...

**“Nivîsa min a vî heftî”** – Eger mirovekî hema hinekî bi sazîya zimanê k’urdî r’a nas be (ez êdî di derbarê r’êzimanê da nabêjim!), dê t’evahîya çewtîya wê hevokê bibîne: li vira

jî, eger p'eyva 'heftê' (an 'hevtê') navdêra zayenda mêza ye, wê demê, eger bi k'urdî be, divê ev hevok weha be: **“Nivîsa min a vê heftê”...**

Evana her t'enê çend mînak bûn, ku min xwesta bala xwendevanan bik'işînim ser wan... Lê di jîyana me ya r'ojaane da mirov li ser her gavekê r'astî bi dehan, bi sedan mînakên weha tê. Lewra jî xwendevanên hêja bi xwe dikarin mînakên wêha di hemû warên jîyanê da bibînin û anegorî qanûnên zimên ên hindur'în wan binirxînin. Bi vî awahî wê bi xwe jî bikaribin r'astî û çewtîyan ji hev cuda bikin û nêrîm û dîtinên xwe di wê derbarê da ji me r'a binivîsin, û emê bikaribin bi hevr'a ji gelek r'a bibin alîk'ar û zimanê xwe ji şaşî û çewtîyên r'êzimanî bip'arêzin...

### **Naha jî em bîn ser pirsar r'astnivîsîn û r'astaxavtina navên bîyanî!**

... Helbet, ji mêj va, hê dema p'ewendîyên yekem ên darayî, bazirganî, siyasî, çandî û dîplomasî di navbera gel û welatan da pêk hatine, pêdivî bi bik'aranîn û nivîsîna p'eyv, têrmîn û navên bîyanî derk'eteye holê. Lê bi t'aybet îro, dema bi p'eydabûna întêrnêtê û medya civakî sînorên di nava p'arzemîn, welat û herêmên cîhanê da sembolîk bûne, p'ewendîyên di navbera nûnerên gel û welatên cuda da berfirehtir bûne, û bi wê r'a îro gelek p'eyv û têrmîn, têgîn û navên bîyanî her'ikîne nava jîyana gelên cuda yên cîhanê.

– Gelo bi p'eydabûna r'ewşeke weha r'a civaka me îro çiqasî amade ye, ku ji van hemûyan r'a bibe bersîv, bikaribe ji hêlekê va zimanê xwe dewlemend bike, lê ji hêla dinê va r'esenîya wî bip'arêze? – Weha mirov bi vî awahî dikare naver'oka p'eyam û nameyên xwendevanan t'omar bike...

Û divê mirov bersîva van pirsan di goveka qanûnên r'êzimanê û zimanzanîyê da biger'e, an jî, bi gotineke dinê, mirov dikare bibêje, ku bersîva pirsên vî r'engî pisporên warên r'êzimanê (*r'êzimanzan*) û yên zimanzanîyê (*zimanzan*) dikarin bidin. An – na, eger em bi vê pirsê berê xwe bidin wan, ên ku p'eyv, têrmîn û navên bîyanî, wek ku ew di zimanê orîjînal da bi alfabeyên wan hatine nivîsîn, bi k'urdî dixwînin, emê negihîjin t'u encamekê...

Çima?

Wek ku tê zanîn, di gelek zimanan da p'eyv, nav û têrmîn bi şewazekî tîn nivîsîn, lê bi şewazekî dinê tîn xwendin. Em hema zimanê îngêlîzî mînak bînin, ê ku îro bûye zimanê danûstandina navnet'ewî û navdewletî. Dibe ku p'ir'anîya xwendevanan dizanin, ku di ferhengan da li rex p'eyvên înglîzî di nava bendên r'ast ([...]) da wisa jî şewazên wan p'eyvan ên xwendinê tîn nivîsîn. Ango di zimanê înglîzî da p'eyv bi şewazekî tîn nivîsîn, lê bi şewazekî dinê tîn xwendin. Û li vira jî pirsgrêka sereke: “Dema bîyanî navekî înglîzî bi k'ar tînin, divê bi çi şewazî binivîsin – bi wî şewazî, wek ku ew di zimanê orîjînalê da tê nivîsîn, an wek ku tê xwendin?” – Û, her çiqas, di vê r'ewşê da di p'ir'anîya zimanên cîhanê da bi heşmendî hatye p'ejirandin, ku p'eyvên bîyanî wisa binivîsin, wek ku ew di zimanên orîjînal da tîn xwendin û bihîstin, ev prênsîpa ji bo bîyanîyan ferzeke ne absolyût e, ji ber ku ew zimanan jî t'aybetîyên xwe yên xwezayî hene ...

Ev r'ewşek e, ya ku bi r'êya hilbijartina xwezayî pêkhatye û di cîhanê da bûye wek kevneşopîyekê!

Lê gelo ev prênsîpa di nava me – k'urdan da çawa tê şopandin?

Li vira hinek xwendevan dê bibêjin – ya me cuda ye, zimanê me t'aybetmendîyên xwe hene. – Û ewê r'ast bin, wek ku min êdî li jorê gotye, *her çiqas, di vê r'ewşê da di p'ir'anîya zimanên cîhanê da bi heşmendî hatye p'ejirandin, ku p'eyvên bîyanî wisa binivîsin, wek ku ew di zimanên orîjînal da tîn xwendin û bihîstin, ev prênsîpa ji bo bîyanîyan ferzeke ne absolyût e, ji ber ku ew zimanan jî t'aybetîyên xwe yên xwezayî hene ...* Lêbelê, ji bo ku wisa nebe, ku em bibin mîna wan mirovan, ên ku di sedsala XXI da jinûva duçerxê (*velocipede*, psîkîlêt) “p'eyda bikin” û r'êveka (direksiyon) wê jî di dawîyê da daynin (!?), di vê r'ewşê da divê mirov anegorî qanûnên zimanzanîya giştî li pirsê binihêr'e...

Bala xwe bidinê, eger ev r'ewşa dîsa bi vî awayî bidome, dema hinek kesên cuda di

wêje, çapemenî, weşanên r'adîo-têlêvîzîonên k'urdî û medya civakî da p'eyv, nav û têrmînên bîyanî bi şêwazê wan ê zimanê orîjînalê dinivîsin, lê bi k'urdî dixwînin, piştî demekê dê wisa bibe, ku nivşên k'urdan ên pêşer'ojê dê wisa jî r'astya wan p'eyvan nizanibin? Û, gelo kesekê bikaribe bibêje, eger di wêje, p'erwerde, çapemenî, weşana r'adîo-têlêvîzîonê û medîya civakî da bik'aranîna p'eyvên bîyanî bi vî şêweyî bidome, r'ewşa zimanê k'urdî dê çawa be?

Ev pirsra îro net'avefîyê dide gelek xwendevanên k'urd, ên ku xwendîna wan t'enê bi k'urdî bisînor nabe, û gelek ji wana dixwazin bizanibin, k'a gelo nav, têrmîn û p'eyvên bîyanî di k'urdî da divê çawa bîn nivîsîn?

Û di vê r'ewşê da tiştê ku mirov matma dike, ew e, ku ji wan xwendevanan gelek di R'ûssîyayê û k'omarên dinê ên Sovêta berê da mezin bûne, p'erwerdeya wana bi zimanên wan welatan e, ma ew nabînin, k'a bi wan zimanan navên *nivîsk'ar*, *zanîyar*, *hunermend*, *wenegêr* û *dîroknûsên* bîyanî di wan zimanan da çawa tên nivîsîn?

Wek ku tê xuyan, a ku ji bo wan xwendevanan dibe asteng, ku ew vê tê bigihîjin, ew e, ku alfabêya k'urdî li ser bingeha tîpên latînî hatye sazkirin? Hema, divê bêzanîn, her çiqas gelek gelên cîhanê yên dinê jî alfabêyên xwe li ser bingeha tîpên latînî saz kirine (înglîz, alman, firansî, çêx, polonî, slovên û yên dinê), lêbelê ew navên bîyanî ne ku r'astêdêr bi zimanê xwe dixwînin, lê, berê pêşin, wan nav û têrmînan bi zimanê xwe wisa dinivîsin, wek ku ewê di zimanê orîjînalê da tên xwendin û bihîstin, û her paşê, eger pêwîstî bi wê hebe, li r'ex wê di nava bendê (cotkevanan) da dikarin orîjînalê wan peyvan binivîsin...

Û li vira jî ezê hewl bidim, bi mînakên bersêa wê pirsra xwendevana bidim, k'a gelo navên bîyanî bi k'urdî divê çawa bîn nivîsîn û xwendin?

Em di sêrî da hinek navên kurteberêv (*Abbreviation*) binihêr'in, ên ku bi wan şêwazên xwe va êdî bûne wek têrmînên navnetewî. P'ir'anîya gelên cîhanê wan navan wisa dinivîsin, wek ku ew di zimanê orîjînalê da tên xwendin, lê, dîsa jî, eger ew pêwîst bibînin, dê şêwazên nivîskî yên orîjînalê di nava cotkevanan da binivîsin. K'a, em jî, wek mînak, anegorî vê pîrênsîpê çend mînakên ji wan binihêr'in, k'a ew divê di k'urdî da çawa bîn nivîsîn û xwendin:

Bî-bî-sî (BBC)

Êy-bî-sî (ABC)

Sî-bî-ên (CBN)

Sî-ên-ên (CNN)

Yûnêsko (UNESCO) û yên dinê.

Û mirov nizane xwe di k'uda veşêre, dema dibîne, k'a çawa hinek nivîsk'ar, mamosta, r'ojnameger û li dû wana wisa jî hinek xwendevan van p'eyvan, wek ku ew di zimanên orîjînalê da hene, dinivîsi û wan bi k'urdî dixwînin: UNESCO, CNN, BBC, ABC, CBN,!

Naha jî em binihêr'in, k'a navên nivîsk'ar, hûnermend û siyasetmederên bîyanî divê anegorî vê qanûnê çawa bîn nivîsîn:

Albert Camus – Albêr K'amyû

Andrew Collins – Êndryû K'ollînz

Biden – Baydên

Clinton – K'lînton

François Mitreand – Fransûa Mîtêran

Jacques Chirac – Jak Şîrak

Shakespeare – Şêk'spîr

Schubert – Şûbêrt

Trump – Tramp

Xenophon – K'sênofon\*

û gelek-gelek navên dine.

Û, eger mirov van navên bi alfaabê û anegorî r'astnivîsîna zimanê bîyaanî nivîsî r'astedêr bi k'urdî bixwîne, gelo kesek dikare bibêje, k'a bi wê emê xwe bikin çi r'ewşeke pêk'ênîtîyê? ...

\*Van demên dawîyê xwendevanekî me yê ji Ewropayê ji min r'a p'eyamek nivîsî. Bi gotina wî, ewî di dema xwe da nivîsên min ên di derbarê zimanê k'urdî da şopandine, ku p'irtûka min a "Zerdeşt pêxember (Rûpelên dîroka "windabûyî" ...)" xwendye... û hinek tiştên dinê. Helbet, min p'eyvê dilxweşî û spasîyê ji wî r'a nivîsîn... Peyr'a ewî di derbarê nivîsîn û xwendina navên bîyanî, û di nava wan da wisa jî – di derbarê navê dîroknûsê yewnaî yê sedsalên V – IV ên berî serdema Îsa, K'sênofon da pirsî... Bi gotina wî, şaş e, ku mirov wî navî wek *K'sênofon* bixwîne û binivîse, ji ber ku şêwazê wî navî yê bi îglîzî (*Xenophon*) ne r'ast e, lewra ku ew tîpa X (iks) di yewnanî da wek X (xî) tê xwendin...

Dema min bi matmayî pirsî xwe nivîs, k'a ewî ev ji k'u anî? – Ewî bersivand, ku ew wê wisa dizane, ku ewî ji mamostayekî zimanê k'urdî bihîstye...

Wê demê min jê pirsî, k'a, gelo ew bi alfabêya yewnanî r'a nas e? – Ewî bersivand – Na! Wê demê ez neç'ar bûm şiroveya xwe ji alfabêya Yewnanî destpê bikim. ... Û bidim zanîn, ku bi yewnanî ne navê *K'sênofon*, ne jî navekî dinê, yê ku di wî da duawaza 'ks' heye, bi tîpa yewnanî ya X (xi) nayên nivîsîn, ku di alfabêya yewnanî da tîpa Ξξ (ksî) heye (ew di r'êza alfabêya yewnanî da ya 14-em e!), û ew navana bi wê tîpê tên nivîsîn. Mînak: Ξενοφών (K'sênofon), Ξέρξης (K'sêrk'sês), Σαίτηρ (Sêk'spîr) û hwd.

Û min ji wî xwendevanê hêja r'a li gel siav û r'êzên xwe alfabûya yewnanî jî wek dîyarî şand.

#### Alfabêya yewnanî û navên tîpên wê bi tîpên k'urdî:

1. Αα (Alfa)	13. Νν (Nyû)
2. Ββ (Bêta)	14. Ξξ (K'sî)
3. Γγ (Gamma)	15. Οο (Omîkron)
4. Δδ (Dêlta)	16. Ππ (Pî)
5. Εε (Êpsîlon)	17. Ρρ (R'o)
6. Ζζ (Dzêta)	18. Σσ/ς (Sîgma)
7. Ηη (Êta)	19. Ττ (Taû)
8. Θθ (T'êta)	20. Υυ (Ûpsîlon)
9. Ιι (Îota)	21. Φφ (Fî)
10. Κκ (Kappa)	22. Χχ (Xî)
11. Λλ (Lambda)	23. Ψψ (P'sî)
12. Μμ (Myû)	24. Ωω (Omêga).

\*\*\*

Û gotarên dinê jî – yên di derbarê r'astnivîsîn û r'astaxavtina zimanê k'urdî da, yên ku dikarin ji bo xwendevanan balk'êş bin:

“Carek a dinê li ser pirsên r'astnivîsîn û r'astaxavtîne”

[https://www.amidakurd.org/ku/tekst/carek\\_a\\_din%3%aa\\_li\\_ser\\_pirs%3%aan\\_r\\_astniv%3%v%3%aes%3%aen\\_%3%bb\\_r\\_astaxavtin%3%aa](https://www.amidakurd.org/ku/tekst/carek_a_din%3%aa_li_ser_pirs%3%aan_r_astniv%3%v%3%aes%3%aen_%3%bb_r_astaxavtin%3%aa)

“P'eyvên bîyanî di k'urdî da divê çawa bên nivîsîn û xwendin? ”

[https://www.amidakurd.org/ku/tekst/P\\_EYV%3%8aN\\_B%3%8eYAN%3%8e\\_DI\\_K\\_URD%3%8e\\_DA\\_DIV%3%8a\\_%3%87AWA\\_B%3%8aN\\_NIV%3%8eS%3%8eN\\_%3%9b\\_XWENDIN](https://www.amidakurd.org/ku/tekst/P_EYV%3%8aN_B%3%8eYAN%3%8e_DI_K_URD%3%8e_DA_DIV%3%8a_%3%87AWA_B%3%8aN_NIV%3%8eS%3%8eN_%3%9b_XWENDIN)

28. 03. 2021.

Pyatîgors/R'ûsîya

**Çavkanî:** [https://www.amidakurd.net/ku/tekst/ÇEND\\_TÊBÎNÎ\\_DI\\_DERBARÊ\\_PIRSÊN\\_R\\_ASTNIVÎSÎN\\_Û\\_R\\_ASTAXAVTINÊ\\_DA](https://www.amidakurd.net/ku/tekst/ÇEND_TÊBÎNÎ_DI_DERBARÊ_PIRSÊN_R_ASTNIVÎSÎN_Û_R_ASTAXAVTINÊ_DA)